# DENGÊ KURD

10 xermanan 2713 k   1-8-2013 z   DENGê KURD -hjmar (13)   www. Pdksp.com


# Rojavayê kurdstanê cavnêrê kobûnên partî û (pyd)ê ne

## Yekîtî

Îroroj û berî hertiştî û berî herdemê yekîtiya rêz û hêza Kurd û tevgera Rizgarîxwaz pêdviyeka dîrokiye ji ber ko em di qeyraneke mirovjarî de derbas dibin, dêmekî bêhêvîbûn û tiralî û qelsîtî tu kelk û sûdê nadin û paşî gohkirin ji pirsgirêkara karekî neberpirsiyaneye û bêhna xinzîrê jêtê. Yekîtiya Part û alîgirên siyasî di vê qunaxê de xwesteke cemaweriye da ko rûberûbûn saz û tekûz dibe li hemberî helmet û êrîşên dijminan. Yekîtî pêdivê ji ber ko asteng û berkaşî zorin û belavin ev berkaşî çarenûsî ko man û nemane kêşe doza Kurd û hebûna wî hildigrê û çespînê li gorepana Azadî yê û Rizgarî yê. Yekîtî ango tendirustî yan hestê netewî û serraskirina civaka welatparêz û tevgera rizgarîxaz.

**Dengê kurd**



## Konfirasa Yekemîn ji Werzişvanên Rojavayê Kurdistanê

3L

### Şanogeriyên Komerîşkên Çekdar li Rojavayê Kurdistanê

3L

### Xewna azadiyê û xewna zanistiyê

4L

### Amûdê yekem ezmûn di rojavayê kurdistanê de

www.arsivakurd.org

# Şanogeriyên Komerîşkên Çekdar li Rojavayê Kurdistanê

**Şêrzad osman Am û dê**

Careka dîtir Komerîkên çekdar bi helmeteke leşkerî rabûn dijî herdû li deverê Kurdî li seranserî Rojavayê Kurdistanê çi li Efrînê û çi li kobanê lê Şerû pevçûna mezin li Serêkanîyê li darket dinavbera çekdarî (ypg)ê û bereya (nusre) de yekser çekdarên ypg serkeftin bi destxweve anîn , lê wa diyarbû ko bazarbaziyeke hebû di navbera herdû çekdar de kiriyara rastiyê û destpêdanê di bazarbaziyêde hebû çimkî dûmana 85 melyon Lîreyê Sûrî ji ber xêrîkê derket û wisa bazarbaziya Şêxmeqsûd li Helebê beriya Çend mehan di bîrahiya me de anî ev bazarbazî dêmekî wekû xuyanê dibe ko şanogeriyeke Siyasiye bi kirasekî laşkerî xwe da pêş li gorepana bûyerî Qewmanên cenga kambax li seranserî Spriyayê , ev bûyerê sencrakêş sê rehindên berbiçav diçespîne di hesûyê tevgera dîrokê de li rojavaê Kurdistanê.

1- rijêma esed (pyd)ê kiriye jixwere zirdarekî kujkar kengî beryeberyemeniya wî bixwaze ewê wî bi karbîne û nexasma dema ko li deverkê bişkê an têkeve qeyraneke siyasî çi li astê navxoyî an nav herêmî an li bazara siyasî ya navnetewî û wisa ji pyd li ser xwe pijirandiye bi evî rolî rabe .

2- tewerî Silêmanî yê ko pêkhatiye ji çend Part û Şepêl û Komerîşkên siyasî Kurdistanî ew tewerê ko dixazêli himberî biryara Hewlêr raweste ew biryara ko der bûye ji rêkeftina wê ya dîrokî da ko karûbarê siyasî li rojavayê Kurdistanê rastûserrast bibe, ew tewer dixaze berdewam biryare Kurdî ya sitratîcî pêşêl bike di pênava berjewendîyin navherêmî de , lê pendgîriya hewlêrê û rehendkêşa wînî tênerên radiweste wekû dîwarekî netew perwer li himberî hemû tevlîhevî û nakokiyên Dijber û navbir ji ber ko biryara Hewlêr biryarake Kurd Perwere.

3- Berjewendîyên Bazara Siyasî ya navnetewî handerekî serekî ye bo navtêdanê ji (pyd)ê re da ko dest bi kiryarên xwey çekdarî bi ke weko lîstvanekî serdest û karbidest li Rojavayê Kurdistanê û wisa ew nebûna deshela viyanî navnetewî bo çareseriya kêşedoza Sûryayê û dest hêwerdana gelek alîgirên ewê bazara Siyasî di girêbendiya rewşa û barûdoxê Sûriyayê de di gel çend alîgirên nav herêmî dejî. Li dûmahîkê ew kiryarên çekdarî û Şanogexuyanê dibin ko Şanogeriyin destkarîkirîne ji ber ko berahî kû naverok û domahîka wan li hev naguncin dêmekî şanogeriyin fedîkar û şermesarind hevsengî û terzûya siyaseta Kurdî de.



# Civîvên Partî û PYD ê armanc û hêvî

## Xeleka (1)



**M.Emîn Sadûn**

Eve bêhtirî çar heftiya ne civînên dualî di navbera şandên partiya Demoqrata Kurd li Sûriyê ( Partî ) û partiya Yekîtiya Demoqratîk ( PYD )ê de li Hewlêrê, di bin çavdêriya dîwana serokatiya Herêma Kurdistanê de berdewam in.wek tê bihîstin û gotin ku ev hevdîtin veşartî û dûr ji çavên kamîreyên dezgehên ragihandinê tên kirin. lê çiqasî jî agahî û pêzanîn ne derkevin, her xalên serekî yên danûstandin û giftûgoyan eşkere ne, her ew alozî, pirsgirêg, rûdanên diltevzîn,rewşa aborî ya xirab,bêkarî,penaberî,tirsa ji guropên çekdar,zincîra pirsên ku îro bi xurtî li civaka kurdî derdikevin û metirsînê li ser paşeroja gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê bi xwe re hildigrin û berçav dikin,bê guman wê di wan civînan de bêne raxistin û li ser seknandin. di vê dema nazik û hestyar de îro çareserkirina wan mijar û babetên giring, pêwestiyek herî li pêşe û xwestekeke cemawerî bi leze. ne veşartiye ku piştî bîst û heşt heyvan ji şoreşa gelê Sûriyê, hê jî Partiyên kurdî wek rikberiya Ereb ya Sûriyê, wan jî bikin yek û navmala kurdî bi rêk û pêk bikin,û dilê xwe ji hev re vekin û bi rengekê dirust, bi yek dest û dilî rêveberiya gelê kurd û deverên kurdî di warê siyasî, aborî û leşkerî de bikin. raste, rêkeftina Hewlêrê ya ku di nav herdu meclisên kurdî de û di bin çavdêrî û serperiştiya rêzdar cama wê de Mesûd Berzanî de hate morkirin û di en Desteya Bilin A kurdî jî hate avakirin, lê xalên wê rêkeftinê wek her kes dizanê man gotinên li ser kaxezan û di cihên xwe de mirin, tevî ku ew rêkeftin hingî û di wê demê de bû cihê dilxweşî û rezamendiyê li cem piraniya gelê kurd li Sûriyê û li parçeyên dî yên kurdistanê.û em dikarin di vê derbarê de bînin ziman,ku ev rêkeftin piştre vajî armanc û hêviyên li ser hatîn girêdan hate bikaranîn û gelek kar û barên miletê kurd li Rojavayê Kurdistanê şil û şeht kirin, astengî û kelem derxistin û hêviyên vî gelî qurmiçandin. ji ber Encûmena Gel A Rojavayê kurdistanê bi alîkariya hin Partiyên Encûmena Niştîmanî A kurdî xalên wê rêkeftinê weku nêrînên xwe şirove kirin û li gorî berjewendiyên xwe yên hizbî û nêrînên xwe yên cuda xwe dûr û nêzîkê wê kirin, û lê bûne xwedî û lê xwedî jî derketin. evê yekê diltengiyeke mezin û birheke giran da civaka kurdî û pêre jî kul û janeke giran peyda kir, îro ew kul û jan werimî ye û giha ye ber derkirin û teqandinê. Dîsa nayê veşartin tehliya û serpêhatiyên Encûmena Niştîmanî ezmûn A Kurdî û her wiha Desteya Bilin Ya Kurdî,ku reşatiyek dan paşeroja gelê kurd û bêhêvîtî ji wê paşerojê re di civaka kurdî de çêkirin. li vir gelê kurd bêçare ma,îro bi xemgînî di nava direhên wan bêhêvîtî û reştariyan de dibonijê û pêre jî di pirsê ma gelo we heye ev hevpeyman jî wek yên borî bin, yan jê wê bi xwe re tiştin nû bîne ku girêdayî bin bi çareserkirina êş û janên wî ve,û wehe ye ew vê yekê li ser rûyê erdê bibîne, ku êdî ji gotinan derbas bibin û ber bi kar û kirinan ve herin,ji ber ji gotinan têr bûye û ne ma êdî gotin birînên dilê wî dikewînin û hêviyên wî geş dikin.Ne şaşe du partiyên serekî li ser hevpeymanekî li hev werin û bi hev re bighin rêkeftinekî ku bi rêya wê rêveberiya gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê bikin, mîna vê ezmûnê li Başûrê Kurdistanê berî niha hatiye dîtin û encamên baş û berketî bi xwe re anîne û eger ji xwe ew hevpeymana istratîcîk di nav herdu partiyên serekî yên Başûrê Kurdistanê de ne hetiba girêdan. di baweriya me de îro gelê kurd wê bi serkeftin û pêşveçûnên Herêma kurdistanê şanebiba, û di vê derbarê de serok Mesûd Berzanî serokê Herêma Kurdistanê gelek caran dubare kiriye û gotiye : ev serkeftin û pêşveçûnên mezin encamên xwîna şehîdan, hevgirtin û yek rêziya me ye. Lewma em dikarin bêjin eger Partî û ( PYD )e, bi vîneke azad, bi singeke fereh û hişekê vekirî,her wisa bi bawerî û bi berpirsyarîyeke dîrokî ya ku îro wan daye ser milê xwe, bi van civînan rabin, wê guhertineke mezin bêxin di xebata gelê kurd de, ji ber niha çavên miletekî li encamên wan civata ye û dilê vî miletê perîşan û belengaz bi jena wan civatan re dijene, tevî ku berî her tiştî serkeftin û encamdana van civînan di berjewendiya wan herdu Partiyan de ye û ew yeke wê bibe hêza berdewamiya wan wek du hêzên serekî, xwedan pêkarîn û şiyanin taybetmend ku wê paşeroja wan xurt û dabîn bike. belê,di vir de wê gelek alî û hêz ji vê hevpeymana istiratîcîk bênteng û çavsor bibin û wê ne razîbûna xwe di bin armanc û hêviyên mezin de diyar bikin, ji ber aliyên têkildar, çi yên dûr yan jê nêzîk di vê hevpeymanê de,ne veşartiye ku hin ji wana mifadarin û hin zerarmendin, û hin dî xudan berjewendî û helwestin, û ew alî jî evin : gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê, Partiyên kurdî, çavdêr û zêrevanên siyasî, Elewî(rêjîma Sûriyê), Sune(Rikberiya Sûriyê), hêzên nêvdewletî. ka her yek ji wana çi dixwazê û di derbarê vê hevpeymana istiratîcîk de wê çi bibêje !!?. Gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê çîroka wî wek ya mirovê kor e, dema ku ji yê kor pirsîn koro te çi divê, koro vegerand : min piçek ronahî divê. gelê kurd ji destpêka şoreşê ve tevî ku partyên kurdî di wê demê de qelis û lawaz bûn jî, lê gelê kurd guh neda ti hêz û aliyên dî, her xewin û hêvîyên xwe li ser van partiyan hûnandin û ew wek berpirs û nûnerên xwe dîtin û bi taybetî yên serekî ji wana, wek partî û (pyd)ê ku îro nûnerîtiya sedê not (90%) ji gelî kurd li Rojavayê Kurdistanê dikin.vêca dema ku îro herdu partî li hev bikin û bixwazin bi rengekê rast û dirust serkêşî û rêveberiya Rojavayê Kurdistanê bikin û li miletê xwe xwedî derkevin,û wan pirsgirêk û aloziyên di dema borî de rûdayîn çareser bikin. miletê kurd vê yekê bi tenê ji wan dixwaze, her ew bi xwe ye dermanê derd û êşên vî miletî,û wê tenê û tenê ji partiyan dixwazê. di baweriya me de niha milet çavnêrî wan kar û xebata ye yên ku tenê şûn û şopa wan li ser rûyê erdê bixuye.Lê gelo zêrevan û çavdêrên siyasî çawe vê hevpeymana sitratîcîk dixwînin.ji ber serpêhatiyên dema borî nêrînên wan cuda ne ew jî bi tirs û pirsin mezin nêzîkî van civatan,û encam û serkeftinên wan dibin, ji ber vedigerin ezmûn û serpêhatiyên partiya Demoqratîk ya ku her wextî amade ye bi morkirina rêkeftin û hevpeymanan, lê pêgiriyê bi xal û bendên wan rêkêftinan nake û li Imzeya xwe xwedî dernakeve, ji ber vê yekê jî çavdêr û zêrevanên siyasî guman dikin ku (PYD)ê wek tektîk di vê qonaxê de wê imze bike. lê wek istiratîcî wê ti xizmetê jê re neke. û divê derbarê de serpêhatiya Desteya Bilid A Kurdî berçav û diyar dikin.

# Xewna azadiyê û xewna zanistiyê

**Mihemed emîn Erefat**

Di demeke dûr de em hîna xort û ciwan bûn, gelek caran nakokî di nav bera mede çêdibûn wekû heval, sedem pir bûn, aborî, civakî, û ya herî mezin sedemên zanistî bûn, ji bo hin gotinên kurdî yên resen, gelek û gelek gotin hebûn em di berdan hev, lê ya bêtir em pê diramîn û me liser gengeşe dikir azadî û zanistî bûn, azadiyê gelek caran bala me dikişand,û em pê di ramîn, lê her û her ji wateya xwe ya tîpane di hişê mede dernediket, gelo çiqas hêjaye, û ta çi radeyê em amadene di ber de kar bikin, raste carnan ji mere xewin bû, xewneke bê dawî bû,lê gelek û gelek ji mere divê ta em bighêjin wateya wê ya xwerû û resen, li vir zanistî di êt, û gelek piris pêre tên,mîna em kîne?, em çi dixwazin?, û ta çi redeye em di azadiyê de tê gihiştî ne?. Careke din dema min di bîranînên xwe de zaroktiya xwe li bîra xwe tanî, dema ku me ti xem nedixwarin, û ti kul ne dihilkirtin, tenê lîstik û razan,lê dema mirov biçekî mestir dibe,derd û kul jî bi mirov re çêdibin û pêre mezin dibin, yek ji wan kulan bindestî, zor û sitema dijmin bû, û pêre gelek piris dihatin mîna : çima em fêrî ziman, keltûr û gelpûra xwe nabin? çima pertûkên kurdî qedexene? vê yekê dihişt mirov bi peyva hêja li ser ziman birame peyva azadî, carna me digot : Azadî bihna hebûnê ye, Azadî xwena herî dirêje di jiyana mirov de, azadî girêdayî ye bi hebûnê ve, û zaniyriyê ve, çimkî bê gihiştin û têgihiştina wateya azadiyê ya zanyarî û hestyarî, tu nikare diber de kar bike, çimkî ew jena mirovatiyê ye di dilekî hestyar de, kesereke li ser dilekî xemgîn, nerîneke li ser çavekî dildar û melûl, gelek gotinên mezinan me ji xwere dikir nimûne wek helbestvanê mezin cibran xelîl cibran dema di hebesteke xwe de di bêje :(ji min re di bêjin: ger te kolek razayî dît wî hişiyar meke da bi azadiyê ne rame.Ez ji wanre dibêjim : ger min kolekî razayî dît ezê wî hişyar bikim, û jêre li ser azadiyê bi axivim ).Ya herî xweş azadiye,çimkî girêdayî ye bi gewd, giyan, û hiş ve, dema tu bixwaze nifşekî zana û xudan helwest û rêbazek niştimanî rake, dive ev nifş dana azadiye di giyanê wî de bête çandin, nifşekî xudan sinc û zanîn be. dîse ez di bêjim zanîn, çimkî em çiqas azad bin hewqas zanîn ji me tê xwestin, azadî bê zanîn nabe û zanîn bê azadî nabe. Li vêdê berpirsiyariya partiyan, û zanayên me, û çikesê xwedan hastên netwî di êt, da karibin serkirdayetiya vê qunaxê bikin,û di cihê berpirsiyariyê de bin.Çimkî ev qunaxeke gelek hestiyare, û daxwazên vê qunaxê dive em bidin ber çav, da em garibin berê xort û gencên xwe ber bi rêka rast û dirist ve bi bin, rêka zanînê, rêka azadiyê bi wateyeke din, gencekî azad liser bingeheke zanistî bête avakirin, û gencekî zanyar li ser bingeheke azad, ji ber ku ev gencên han nasname ya paşerojê ne, ji bo avakirina bingeheke zaniyarî û zanistî bo kurdayetiyê.Livir têtê xwiyanîkirin têkilya di nav bera azadî û zaniyariyê de, her yek bêyî ya din nabe, û herdû bi hev ve girêdayî ne, çimkî mirov çiqas zana be bê azadî nikare tiştekî pêş bêxe, yan çiqas mirov azad be bê zanîn nikare tiştekî bike, têkiliya di nav bera wan de têkiliyeke bi hêze, em nikarin wan ji hev cuda bikin.Û em li ber çavên xwe dibînin çi miletê ne liser bingeheke zanistî û azadî were ava kirin paşeroja wan ne diyare, û tev mij û dûmane, û zû bizû tên herfandin û roxandin, lewma em dixwazin ava kirina kurdisatna me li ser bingehekî dirist û rast bête avakirin, bingihê azadiyê û zanistiyê .

# Amûdê
## yekem ezmûn di rojavayê kurdistanê de

**Aram Ehmed**



Li rojavayê kurdistanê ûdi her serdem ê dirokêde em weko milet ê kurd dibe yekem care ko wiha dem bi ser mede derbas dibe ,hilmek paqij ji asî manek bi azad em dikşî nin, bi xwe astek nuye ûrola me wê tê xweyakirin ,ew baregeh ên partiyên polî tî k ko xwenbûdi sûrî de em bibî nin li eve bi taybet di bajar ên kurdande em bibî nin. Alayên kurdistanê di pirpirin di wan baregehande,ûwêneyên rêber ên milet ê kurd ji herçar barçan bilind dibibn. Bi çi rengî ûmebest jê çiye ko werin şewtandin ?Avakirin a komele ûhevrêz ên xortan ûkeçan ûyekî tiyên qutabî ûjinan, buyer ên nûjen ên di rojavade. Ji damezrandina yekem partiya polîtî k li rojavayê kurdistanê ta weko î ro armanc ên tên xweyakirin ko berjewendiya milet ê kurd li ser berjewendiyên partiyandeye ûberjewendiyên keseyatî .Kengî dê ji ezmûn ên ko bi ser mede hatî n dê mifakî jê wergirin? Çi kesê xwe dibî ne di xizmet a kurdaytiyêde ûnetewa milet ê kurde dibe ko bi zane şerê di nav bera kurd ûkurde dibin xizmet a dijmin deye,divê ew kes ên xwe dibî nin siyaset meda, serkirde,berpirsyar xwe bibî nin hêvî ûomî d a gelin,me bi parêzin li me bibin xwedî Amûdê wê bimî ne rûpelek reş li ser eniya kes ên alî karî di wê buyerê de kirin, di nêrî n a minde her siyaset medarek her rewşenbî rk her welatparêzek di ber wê buyerêde dibe gunehkar. Avakirina hêz ên leşkerî û asayiş ciyê serbilindiyê ye jibo kurdan. Dî rok wê dilovaniyê li me neke, ka berjewendiya milet ê kurd? Her partiyek yan hêzek yan hevgirtinek nûwere damezrandin eger ne dibin xizmeta netewî ûniştî maniya milet de be emê çi mifa jê wergiein? Emze kirina li hewlêrê ûbi amedebûna cenab ê serok ê kurdistanê Mesud Barzanî ûavakirina desteya bilind a kurdî şeqameke di ruyê her kesek xwe di dî t dijî berjewendiya milet ê kurd. Li hewlêrê tê avakirin yekî tiya gotar a partiyên kurd dibe ciyê razamendiyê di evî demê nazik ûhestiyarde tevlî ko li ser erdê çi tişt ne hatiye xweyakirin ji blî berjewendiyên partiyan pêve .ûhî n dimî nin ciyê rêzgirtin a şeqam a kurdî .Dibe ko em xwedî nêrî nbin, dî rok wê dilovaniyê li me nake ûnifş ên werin wê me bikin ciyê pirsiyariê. Çi dezgeh ên werin cî bi cî kirin eger ne dibin xizmet kurdan de be çi ji hebûn a wan dimî ne? Kuştin a kurdan li ser dest ê kurdan bi çi rengî tê şêruvekirin? Partiyên siyasî ,komele, hevrêz, asayiş, hêz ên leşkerî ne bi tenê axaftin a we bi ziman ê kurdî win xwediyê miletin. Berjewendiya milet ê kurd li ser her tiştan reye ûhî n win dikarin hev bi pejrî nin. Dilovanî li xwe ûli me bikin,yek dest yek armanc bin.da ko em tev Amûdê bikin bajar ê birayetiyê ew bajar ê ko diber yekrêziya siyaset a kurdande xwî n rijand ûherî xort ên hêja can ê xwe dan nextê vê şoreşê. Da ko geyanê pakrewan ên Amûdê di goristanêde bi rehetî razinWerin ûli Amûdê emzabikin ji heram kirin a xwî n a kurdan li ser kurdan ûsozê bidin ko wiha buyer wê nebin di roj ên bêde, da ko birî n ên birî ndaran sax bibin.

# Tenazî
## Qoling û Rovî

**Can Bapîr**

Mîvanperweriya Qoling û Rovî, Dibêjin: rojekê Rovî Qoling de,iwet kir ser firavînê, ji boy ku em nasbikin Firavîn çawabû, Rovî Pilorek çêkir û li ser latekî rêxist û got fermo biray Qoling ev xwarina min ji bo te amedekiriye, de pêşda bixwe …, Qolingê reben rabû Nikulê xwe di wê Tehtê de lêxist, lê sûd ji Pilor û Xwarina Rovî wernegirt, bi xwe re mijol bû û got: eze tola xwe ji Roviyê feylebaz bistînim, rabû go birayê Rovî te wiha nirxên min girt û te ez bi Firavîn û Xwarin kirim, vê carê ti were mîvandariya



min birayê delal, ma ne dibêjin ta Hêsrê Çavan ew jî bi deynin, bû roja din …, Rovî berê xwe da mala Qoling û çû …..Qoling pêşewaziyak bi şahî li mîvanê xwe kir û got: birayê Rovî anha min Xwarin amadekiriye de fermo, dema Rovî bala xwe dayê dît ku çend lib Nok Qoling xistine binê kozekî histi dirêj e, Rovî dorê re çû û hat…., ne serê wî dikete devê Koz û ne Zimanê wî bi libek Nok bû ev çîroka me ji were got: ku herdu Encuman ya Rojava û ya Niştîmanî li Rojavayê Kurdistanê rêkeftinên wan wekî De,iweta Qoling û Rovî ne, heger herdu Encuman li ber fêl û Hhuneran bin herdu jî Firavîna netewî bê par bimînin

www.arsivakurdi.org

# Peymangeha BEDIRXAN

# Gava Mezin ji Gava Piçûk Dibiŝkive



**EBAS MÛSA**

Piştî du salan ji şoreşa rûmetê li Sûriyayê, dîwarê tirsê şikest, û rejîm ji hinek bajarên kurdî vekişî. Vê vekişandinê gelek tişt diyarkirin û derî fereh li ber pirsan vekir. Gelo ma em dikarin barê azadiya xweş û giran hilgirin?! ger em pirsa siyasî bidin aliyekî û bersivan bi hêlin ji wan re (ji ber em divê mijarê de, di tiştekî din de di xebitin). Jibilî karê siyasî yê ku kolanên kurdî pê mijûldibin, li gel ku yê giring û lezgîn ewe, ji bilî vî karî; karê çand û wêjeyî dixuyê weku pencereyek fereh li ber çand û wêjeya kurdî vebûye, lê ev çand û wêje û jiyana kurdî bi hewceyî xwendevanin bi zimanê kurdî ye. Zimanê kurdî bi dehê salan qedexe bû birengekî dijwar, ta ku axavtina bi kurdî jî qedexe bû di dibistan û deverên fermî de. Dibin qedexekirina bivê zodariyê, zimanê kurdî li berxwedida!. li bajarê kurdî komikên zimanê kurdî fêrî zimên dibûn, û bi dehê ciwanan hînî tîpan dibûn, wiha li zanîngeh û gundan. Lê ger em bixwazin bi pirsin: ta çiqasî zimanê kurdî li berxweda? Bersiv ewe ku fêrkirina zimên ma di çarçoveya tîpan, an di astê jêrîn di ziman de. Û di ber wê de jî wêje û çandeya kurdî ma bi tenê bê xwendevan, û mabû ku rewşenbîr û nivîskarên kurd ji hevre binivisînin û ji hevre bixwînin.

# Zimanê kurdî şevreş û ronahî

Birastî ger di dirêjiya du salan de em binêrin li rewşa zimanê kurdî emê dilşadbin. Bi sedê zarokan, mezinan, jin û mêr, fêrî zimanê kurdî dibin. Bi dehê navendan vebûn li seranserî bajarên kurdî û li deverên mîna Şam û Heleb (cihê ku kurd lê dijîn).Ev navend tev ku gelek çalakî li dardixin, çi civakî yan rewşenbîrî yan jî siyasî, lê tim beşekî fereh ji çalakiyên xwe kirin ji zimanê kurdî re.Û her roj tu karê bêje ku nifşek derdiçû, û piraniya caran bi amedebûna ragihandina kurdî, ji ber ku hîna zimanê kurdî nûçeyek ragihandinê ye.Rojnamegeriya kurdî guhdanek taybet da zimanê kurdî, û dehê raportan weşandin li ser rewşa zimên çi di qenalên asimanî, çi di kovar û malperên internêtê.



Korname yê zimanê kurdi ( dêrîk)

# Konfirasa Yekemîn ji Werzişvanên Rojavayê Kurdistanê Re






Li roja 12/7/2013 Werzişvanên Rojavayê Kurdistanê Konfirasa yekemîn lidarxistin paşî ko Şoreşa Sûriyayê karîgeriyeke xwey dijwar hebû li ser qatûçîna werzişkariyê çalekvan û wisa pirtirîna werzişvan belavwelav bûn .Li gelek dever û welatan û nexasma Herêma Başûrê Kurdistanê û li Ronîdana evê rewşa nalebar gulbijêrek werzişvan civiyan li jêr duruşmê ( werziş di karbendiya Şoreş û rizgariyê de ) û çendîn biryar hatin sitandin di vê pênavê de :1- damezrandina yekîtiya werzişvanên Rojavayê Kurdistanê. 2- damezrandina Desteyeke Bilind ji hemû lîstikan re. 3- çêkirna rebelê Şepiya pê wekû pêwîstirîn werzişkarî. 4- çêkirna Komîteya dadkaran . 5- çêkirna Komîteya Hunerkar ji hemû lîstkan re. 6- çêkirna Komîteya rahêneran. 7- damezrandina Sindoqeke darayî. 8- çêkirina Komîteya ragehandin û serpirştiyar ya giştî. 9- hilbijartina Serokê Yekîtiya werzişvanan ( dadkarê navnetewî Ebidlqadir Mihemed Elî ). Hêjaye gotinêye ko dergehê Yekîtîyê vekiriya ji hemû werzişvana re çi li welêt û çi li dervê welêt

## Zimanê kurdî

**Meysera derwîş**

### Ev ne derewe

Lê ev xewineke pir mezine
Ev bexçekî tevî gule
Ev jiyaneke niwe
Li welatê min jîn dibe
Şoreşek pir giran û ferehe
Şoreşa zimanê kurdîye
Ev ne derewe
Lê belê ev şoreşa me kurdaye
Şoreşa pênûsekêye
Bi zimanekî şêrîn dinvîse
Li welatê min hatiye danîn
Biwe rast ew xewina şêrîn
Em binvîsin li her cihekî
Birengê kurdî
Em li cîhanê belabikin
Zimanê xwêyî netewî
Em mezin bikin da bibe
Zimanek fermî